



Malbata hêja,
Derfeta zarokên we heye, ji sala duyemîn a hîndekariyê ve tev li hîndekariya zimanê dayikê û çanda welêt - HSKê bibin. Bi van qursan zarok jêhatîniya xwe ya di zimanê destpêkê de li pêş dixin. Bi vê yekê zanîna çanda welat digrin, wek mînak dîrok, erdnîgarî, mûzîk an kevneşopî. Li kêleka xurtkirina zimanê dayikê ya di warê devkî û nivîskî de, gava zimanê wan ê dayikê pir baş be, ewê karibin çêtir zimanên din hîn bibin, û ev yek ji bo avekirina nasnameya xwe, ji bo têkilîdanîna bi xizmên xwe re yan ji bo veqerîna rojekê çêbibe xwediyê wateyê mezîna e. Bi vê armancê em pêşniyar dikin, her malbat zarokên xwe li qursên HSKê bidin qeydkirin.

Wezareta perwerdeyî ya kantona Schaffhausen

Sazkirina qursên HSKê - Agahdariya ji dê û bavan re

Kî

Komeleya Hîndekariya Kurdî ji bo zarokên Kurdan hîndekariya kurdî-kurmancî saz dike û bi rê ve dibe.

Serlêdan

Di sala destpêkê ya xwendegêha seretayî de ji aliyê mamosteyên polê ve qeydkirin tê çêkirin. Qurs di sala duyan de dest pê dike. Qeydkirinek pişt re jî dikare pêk were. Malbat dikarin rasterast bi koordînatoren HSKê re jî bikevin nav têkiliyê, listeya kesên têkiliyê dikarin ji ba wezareta hîndekariyê (Erziehungsdepartement) bistînin.

Kengî

Qurs bi destpêkirina sala xwendegêhê re dest pê dikin. Xwendekar di hefteyê de 2-4 saetan diçin qursê. Qurs bi giştî di demên vala yên derveyî hîndekariyê de pêk tên.

Li ku

Qurs li xwendegêhên fermî yên Swîsre yên seretayî tên dayîn. Yên qursan dimeşînin di derbarê cih û dema qursan de malbatan agahdar dikin.

Nirxandina xwetevlêkirina qursên HSKê / Deqdan

Deq (not) ên mamosteyên zimanê dayikê bidin zarokan, ji aliyê mamosteyên wan ên xwendegêha Swîsrî ve derbasî ser bawernameya wan tê kirin.

Ji dê û bavan re pêşniyarên me yên giştî yên li ser perwerdeya bi du yan pir zimanan

- Li mala xwe bi zarokên xwe re bi zimanê dayikê bipeyivin.
- Zimanê dayikê û zimanê xwendegêhê di nav hev de û bi hev re bi kar neyînin.
- Ji zarokên xwe re bi zimanê dayikê stranên bidin guhdarîkirin û çîrokan vebêjin.
- Zarokên we bila li kêleka pirtûkên bi zimanê xwendegêhê yên bi zimanê dayikê jî bixwînin.
- Ders, karê malê û xebatên din ên zarokên we yên xwendegêhê ji nêz ve û bi rêk û pêk bişopînin. Bi vê yekê hûn berpirsariya xwe ya li hemberî zarokên xwe tînin cih.

Navnîşanên Têkiliyê:

Verein für Kurdischunterricht c/o Hasan Deniz Fronwaldstrasse 94 8046 Zürich Tel.: 078 608 79 14 Email: zimanekurdi.hsk@gmail.com	Giovanna Maggi, Verantwortung Administration HSK Erziehungsdepartement Herrenacker 3 8200 Schaffhausen Tel.: 052 632 71 62 Email: giovanna.maggi@ktsh.ch
---	--